

**ESKE**

**Ermittlung schulsprachlicher Kompetenzen in der Erstsprache**

**KURDISCH KURMANCI**

Aufgabenset 3 bis 4 Jahre Schulerfahrung

© Pädagogische Hochschule FHNW 2018


Professur Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter

Mathilde Gyger & Ursula Ritzau


**Erk**

1. Fermanan bişopîne û tiştên rast bixe hundirê giroverokê.

a. Kûçik, bizin û hesp bixe hundirê giroverokê.



b. Pêlav/sol, gore û kinc bixe hundirê giroverokê.




c. Tasik, sênîk û kér bixe hundirê giroverokê.




## 2. Fermanan bişopîne û tiştên rast bixe hundirê giroverokê.


- a. Li kêleka restorantekê dikana xalê min/apê min heye. Gulên wî yên li ber avahiyê niha pir mezin bûne. Hefteya bê ewê gelekî kar bike ku firotineke mezin pêk bûne. Dikana xal/ap bixe hundirê giroverokê.



- b. Li pola me maseyên nivîsê bi awayekî girover hatine bicihkirin. Maseya Marias li kêleka deriyî ye. Gelek pirtûk li ser maseya Mariasî hene. Maseya Mariasî bixe hundirê giroverokê.



- c. Li parka me cihekî lîstinê heye ku gelek zarok li wir dilîzin. Dayik li binê daran li ser kursiyên dirêj rûdinin. Dayika Christians li ser kursiyê dirêj li kêleka kulîlkan rûdine. Dayika Christians bixe hundirê giroverokê.



3. Ji bo vî wêneyî, nivîsa li gorî wî bibîne. Nivîsê bixe hundirê giroverokê.



Ji bo rojbûna xwe kurik xwarina herî zêde jê hez dikir xwest: Miqarne (maqarna). Dayika wî jê re sêniyeke tije anî û çêja wê (tahma wê) pir xweş bû.

Hefteya borî kurik matmayîneke mezin jiya. Apê wî (xalê wî) istaqozek danî ser sêniyê. Ew ecêb xuya dikir û lepûşkên wî yên mezin hebûn.


Kurik hez dikir biçe serdana dapîra xwe. Ew her dem jê re xwarinên li xweşıya wî diçin çêdike. Doh wê pasteyeke bi çûkolata çêkir. Wî qetekî mezin jê xwar.

## 4. Nivîsê bixwîne û bersiva rast bi xêzka çepûrast diyar bike.

Kûçik û mirov xwediyê çîrokeke dirêj a hevbeş in. Hinek kûçik bi awayê kovî dijîn, hinek wekî nobedar xizmeta mirovan dîkin. Kûçik dikarin di jiyanâ rojane de kesên çavêwan nabînin jî bibin û bînin, mînak, gava bixwazin di traflîqê re derbas bibin. Kûçik li tevahiya parzemînan hene û ew ji nêz ve dîbin xizmîn gur û roviyan.

- a) Kûçik li her aliyê cîhanê hene                          rast   
  çewt
- b) Kûçik dikarin di jiyanâ rojane de                          rast   
alîkariya mirovên çavêwan nabînin bikin.                          çewt
- c) Kûçikêñ kovî qet nemane.                                  rast  
  çewt
- d) Gur xizmîn kûçikan in lê belê rovî                          rast  
ne xizmîn wan in.    çewt

5. Nivîsa di derbarê vî wêneyî de bi dengê bilind bixwîne.



### Şêr û Rovî

Demekê şerekî kal hebû. Ew ji bo here nêçîrê bike pir lewaz bibû. Ji ber wê yekê ji xwe re li qulekê (şikeftekê) geriya. Xwe li wê derê bi cih kir.

Dilê ajalên din li ser keyayê ajalan şewitî. Yek li pey yekê hat serdana şêrî.

Rojekê rovî hat serdanê. Ew li ber şikeftê (qulê) rawestiya. Şêr deng lê kir got: „Were hundir. Ji bo hatina pêşwazîkirina te, ew hêz di min de nemaye.“

Roviyî bersiv da, got: „ Ez dixwazim li der ve bimînim û rawestim heta mîvanên te yên din herin. Ji ber ku ez dibînim, hinek şopêñ ajalan têñ hundirê şikefta te, lê belê yek jî paş de venegeriyaye.“

6. Ji bo tu bersivê li jêrê bidî, nivîsa di erka 5 de bixwîne. Cihêñ rast ango çewt bi xêzkê nîşan bike.


- a) Di seranseriya çîrokê de şêr di hundirê qulê de (şikeftê de) dimîne.      rast       çewt
- b) Rovî diçe hundirê qula (şikefta) şêr.      rast       çewt
- c) Şêr ajalêñ din xwariye.      rast       çewt

7. Ka bêje bê nivîsa di erka 5 de li ser çi ye.

8. Nivîsa di erka 5 de bixwîne û bersivêñ pirsêñ li jêrê, bi devkî bide.

- Tu bawer dikî ku şêr nexweş bû?
- Rovî ji ajalêñ din qurnaztir bû? Tu dikarî ji min re bêjî bê tu çîma wisa dihizirî?
- Tu dihizirî ku em dikarin ji vê çîrokê tiştinan hîn bibin? Tu dikarî ji me re bêjî bê tu çîma wisa dihizirî?

9. Ji 5 wêneyan yekê hilbijêre û bêje bê tu kîjan pîşeyî (karî) dibînî.



10. Gava tu mezin bibî, tu dixwazî kîjan pîşeyî (karî) bikî, li ser bihizire. Li vir nivîseke kin li ser binivîsîne.
